# Zêr a Rasteqîn

# Ji Kitêba Pîroz Ayetên bijarte

Edition 2023
© by GBV
printed in Germany

**GBV Dillenburg GmbH**
Eiershäuser Straße 54
35713 Eschenburg
GERMANY
www.gbv-dillenburg.de
www.gbv-online.org

Di destpêkê de
Gotin hebû û Gotin
bi Xwedê re bû.

Jiyan di Wî de bû û
jiyan ronahiya mirovan bû.

*Yûhena 1, 1 û 4*

Îsa dîsa bi
wan re axifî û got:
Ez ronahiya dinê me;
kesê ku li pey min were,
di tariyê de nameşe û dibe
xwediyê ronahiya jiyanê.

*Yûhena 8, 12*



Îsa ji wî re got:
Rê, rastî û jiyan ez im;
heta ku ne bi navberiya
min be, tu kes nikare
were cem Bav!

*Yûhena 14, 6*

Di roja dawîn û mezin
ya cejnê de, Îsa rabû ser
piyan bang kir û got:
Ger kesek tî bibe, bila
were cem min û vexwe!

Mîna ku Nivîsa Pîroz dibêje,
yên ku baweriyê bi min bînin,
di hundirê wan de dê çemên
avên zindî biherikin.

*Yûhena 7, 37-38*



Ya hemû kesên
westiyayî û bargiran,
werin cem min û ez ê
rehetiyê bidim we!

Ji ber ku nîrê min
hêsan û barê min sivik e.

*Metta 11, 28 û 30*

Ji ber ku berdêla gunehê
mirin e, lê belê xelata Xwedê,
di Xudanê me Mesîh Îsa de
jiyana bêdawî ye.

*Rom. 6, 23*

Ya Xwedê,
dilovaniyê li min
gunehkarî bike!

*Lûqa 18, 13*



Îsa Mesîh dibêje ku:
Bi rastî û bi rastî
ez ji we re dibêjim:
Her kesê ku gotinên
min bibihîze û bawerî
bi yê ku min şandiye bîne,
jiyana wî ya abadîn heye
û nayê darazîkirin,
lê belê ew ji mirinê
derbasî jiyanê bûye.

*Yûhena 5, 24*

Ji ber ku Xwedê
evqas pirr ji dinê hez kir ku,
Lawê xwe yê tekane da;
da ku, bila tu kes, ji yên bawerî
bi wî bîne helaq nebe,
lê bila jiyana wî ya
abadîn hebe.

*Yûhena 3, 16*



Lê belê ew ji ber
gunehên me birîndar bû,
ji ber fesadiyên me ew êşiya;
cezaya ku bona aştiya me bû,
daket ser wî û me bi
birînên wî şîfa dîtin.

*Îşaya 53, 5*

Avay, ez li ber derî
sekinî me û li derî dixim;
ger kesek dengê min
bibihîze û derî veke, ez
ê têkevim cem wî ...

*Peyxam 3, 20*

Da ku,
bi navgîniya baweriyê
rûniştina Mesîh ya di dilê
we de rûnê bide we.

*Efes. 3, 16*



Lê belê wî rayedariya
bûyîna zarokên Xwedê
da hemûyên ku wî qebûl
kirine û bi navê wî ve
bawerî anîne.

*Yûhena 1, 12*

Bi vî awayî bona ku
gunehên we bên paqijkirin
tobe bikin û vegerin, da ku,
bila ji ber Xudan wextên
nûbûnê werin.

*K. Şagirtan 3, 19*

Ji ber,
Lawê Mirov hatiye ku,
li yê windabûyî bigere
û wî xelas bike.

*Lûqa 19, 10*

Îsa dibêje ku:
Hemûyên ku Bav daye min,
dê werin cem min û ez tu
carî yên ku werin cem min,
şunda venagerînim.

*Yûhena 6, 37*



Bona ku ez xelas bibim,
divê ez çi bikim?
... Baweriyê bi Xudan Îsa ve
bîne, bi vî awayî tuyê xelas
bibî, tu û maliyên te!

*K. Şagirtan 16, 30-31*

Werin,
ji ber ku her tişt
amade ye!

*Lûqa 14, 17*

Gunehê her kesê
ku bi wî bawerî anîne,
bi navê wî tête bexşandin.

*K. Şagirtan 10, 43*

Îsa bona sûcên me
ji mirinê re hate dayînê
û bona pakbûna me,
hate vejandinê.

*Rom. 4, 25*



Bi vî awayî,
niha ji kesên di
Mesîh Îsa de ne re,
êdî qet mehkûmiyetek nîne.

*Rom. 8, 1*

Bona hûn bizanibin
ku jiyana we ya abadîn heye,
ji we re, ji yên ku bi navê Lawê
Xwedê ve bawerî anîne re,
van tiştan nivîsandim.

*1. Yûhena 5, 13*

Lê belê bi wê şa nebin ku,
ruh ji we re îtaet dikin,
lê bi wê şa bin ku,
navên we li ezmanan
hatine nivîsandin.

*Lûqa 10, 20*

Niha, em bi baweriyê
ve salih hatine hesibandin,
bi navgîniya Xudanê me
Îsa Mesîh, bi Xwedê
re aştiya me heye.

*Rom. 5, 1*



Ji ber ku
hûn bi rêya baweriyê,
bi xêrê ve xelas bûn û ev
ne ji we, xelata Xwedê ye.
Bona ku kes pesnê
xwe venede, ne ji
dawiya karan e.

*Efes. 2, 8-9*

Bila bona diyariya wî ya ku
bi gotinê ve nayê vegotin
şikirî ji Xwedê re be!

*2. Kor. 9, 15*

Ger em jî di
ronahiyê de bimeşin,
bi hev û din re paydariya
me hebe û xwîna Lawê
wî Îsa Mesîh, me ji her
gunehî ve paqij dike.

*1. Yûhena 1, 7*



Îsa Mesîh dibêje ku:
Mîhên min dengê min
dibihîzin û ez jî wan nas
dikim û ew li pey min tên
û ez jiyana abadîn didim wan
û ew abadîn helaq nabin
û tu kes nikare wan ji
destê min derxîne.

*Yûhena 10, 27-28*

Lewre Mesîh jî,
bona hûn di şopa wî de biçin,
ji bo we keser kişand û ji
we re bû mînak.

*1. Petrûs 2, 21*

Têkoşîna qenc,
ya di oxra baweriyê
de bidomîne ...

*1. Tîm. 6, 12*



Niha,
em bi navgîniya
vaftîzê ve bi wî re, ji
mirinê re hatin binax kirin;
da ku, Mesîh, çawa bi bilindiya
Bavo ji mirinê ve vejiyabe,
em jî bi vî awayî di nûbûna
jiyanê de bimeşin.

*Rom. 6, 4*

Ûa vay,
ez hemûya rojan, heta
dawiya dinê bi we re me!

*Metta 28, 20*

Ûsa jî bila ronahiya we li
ber mirovan şewle bide ku,
bila ew jî xebatên we,
yên qenc bibînin û ji
Bavê we yî li ezmana
ye re şikir bikin.

*Metta 5, 16*



Lê belê ez dibêjim:
Di rêvebiriya Ruh
de bijîn û wê demê
hûn tu carî xwestinên
bedenê naynin cîh.

*Gal. 5, 16*

Rûhê Pîroz yê Xwedê
bi keserê ve mexin!

*Efes. 4, 30*

Ji ber ku kî ji
ber min û gotinên
min ji xwe fihêt bike,
dê Lawê Mirov jî ji
ber wî ji xwe fihêt bike,
gava ew bi rûmeta xwe
û ya Bavê xwe û ya
milyaketên pîroz
ve were.

*Lûqa 9, 26*



Gîha hişk dibe,
çîçeg diçilmise;
lê belê gotina Xwedayê
me abadîn dimîne.

*Îşaya 40, 8*

Erd û ezman
dê bibihûrin, lê belê
gotinên min nabihûrin.

*Lûqa 21, 33*

Her tiştên ku we
bi duê ve xwestiye,
bawer bikin ku we wê
stendiye û dê ji we re bibe!

*Marqos 11, 24*

Hûn bi navê min her
çi bixwazin, ez ê wê bikim;
da ku, Bav di Law
de bilind bibe.

*Yûhena 14, 13*



Belê, bi hezkirina
abadȋn ji te hez kirim;
bo vê yekê te bi dirûdiyê
kişandim cem xwe.

*Yêremya 31, 3*

Metirse,
ji ber ku ez bi te re me ...

*Îşaya 41, 10*

Ji ber ez diçim ku ji
we re cîh amade bikim.

Û ger ez herim û ji we
re cîh amade bikim
û bona ku hûn jî li wî
cîhê ku ez lê me bibin;
ez ê dîsa werim û we
bigirim cem xwe.

*Yûhena 14, 2-3*



Ji ber ku Xudan bi xwe,
dê ji ezman ve dakeve
û pêşiyê dê miriyên
aidî Mesîh bivejin.
Paşî wê em, yên ku dijîn
û hatine hiştin, bi wan re,
bona pêrgîniya Xudan
di nava ewran de dê me
rahêlin bibin û bi vî awayî,
em ê her tim bi
Xudan re bin.

*1. Sel. 4, 16-17*

Û min ezmanek
nû û erdekî nû dît.
Û dê Xwedê hemû hêsiran
ji çavên wan ve paqij bike
û êdî dê mirin tune be
û êdî dê ne şîn hebin
û ne girî û ne jî êş hebin.

*Peyxam 21, 1 û 4*



Ax vay, ez zû têm.

Û bila yê bibihîze, bêje:
Were! Û bila yê tî bûye
were û yê bixwaze,
bila ji ava jiyanê ve
bê berdêl bistîne!

Amîn!
Were, ya Xudan Îsa!

*Peyxam 22, 12, 17 û 20*

Kitêba Pîroz ya Gotina Xwedê yî, bixwînin. Guh bidin Dengê Xwedê. Xwedayê bilind bi we ra têkildar e. Dixwaze hûn hezkirina Wî binasin. Dixwaze hûn hezkirina Wî binasin. Ew di Gotina Xwe da bi xwe rêya ku diçe aştî, bextewarî û xweşiya rasteqîn nîşanî we dide.

Ger Kitêba we ya Pîroz tunebe, li ser daxwaziya we, em ê bi dilşayî beşek ji Kitêba Pîroz ji we ra bişînin.

Ger di derbarê baweriya me da her pirsek we hebe, em ê bi bersivdayîn wê kêfxweş bibin.

Pure Gold

GBV 166 4120 Kurdish-Kurmanji